Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :986 | 10-Tebax- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# ‘Hêza’ xelata 7’an diyarî Deniz Firat kir

**Belgefilma ‘Hêza’ li Mihrîcana Belgefilman ya Portekîzê hêjayî xelatê hat dîtin. Derhêner Derya Deniz, xelata filmê ya 7’an diyarî rojnamevana şehîd ‘Deniz Firat’ kir.**

Belgefilma ‘Hêza’ ya bi derhêneriya Derya Denîz behsa jineke têkoşer ya Êzîdî dike ya ku ji destê çeteyên DAIŞ’ê rizgar dibe. Belgefilm hêjayî xelateke din a navneteweyî hat dîtin.

‘Hêza’ herî dawî beşdarî mihrîcana belgefilman a Portekîzê ya li bajarê Melgacoyê bû û ev bajar jî bi berxwedêriya xwe ya li dijî faşîzma Salazar tê nasîn! Mihrîcana Belgefilman ya MDOC-Melgaco di navbera 1-7’ê Tebaxê de pêk hat. Ji 25 welatan 42 belgefilmên kurt û dirêj beşdar bûn. Atolyeyên nîqaşê jî hatin lidarxistin. Hêja di mihrîcanê de hêjayî xelata ‘Don Kîşot’ hatiye dîtin. Afat Baz ku bi navê ekîba belgefilma ‘Hêza’ xelat ji jûriyê girt, li ser navê ekîbê ragihand ku ew xelatê diyarî rojnamevan Denîz Firat dikin.

Denîz Firat 8’ê Tebaxa 2014’an, çaxê ku êrişên çeteyên DAIŞ’ê yên dijî Wargeha Penaberan a Mexmûrê dişopand, bû hedefa guleyên çeteyên DAIŞ´ê û şehîd bû. Belgefilma ‘Hêza’ heta niha bi giştî 7 xelatên navneteweyî li mihrîcanan girtine.

***Ozgûr Polîtîka***







# Berhema wênekêş Alan Roj li Moskovê xelata dereceya sisiyan girt

**Di pêşangeha navneteweyî ya li Galeriya Tretikovskayê ya li Moskovê de, berhema wênekêşê ji rojavayê Kurdistanê Alan Roj ya bi navê ‘Çavên Zarokekî ji Şingalê’ xelata dereceya sisiyan girt.**






Li Galeriya Tretikovskayê ya Moskovê ya paytexta Rûsyayê di 7’ê Tebaxê de merasîma bidawîbûna Pêşangeha Hunera Hemdem a Navneteweyî pêk hat.

Pêşangeh bi piştgiriya Şaredariya Moskovê, Yekitiya Hunermendan a Rûsyayê, Yekitiya Hunermendan a Ewrasyayê, Wezareta Pîşesazî û Bazirganiyê ya Rûsyayê hate organîzekirin. Ji Rûsya, Sûriye, Îsraîl, Çînê, Swêd, Ermenistan, Qazaxistan, Azerbêcan û gelek welatên din nêzî hezar berhemên wênekêşiyê beşdarî pêşbirka vê pêşangehê bûn.

Li ser navê Nûnertiya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya Federasyona Rûsyayê jî wênekêş Alan Roj bi berhema xwe ya bi navê “Çavên Zarokekî ji Şingalê” di pêşbirkê de xelata derece sisiyan girt.

Hunermendê Alan Roj di pêşangeha navneteweyî ya li bajarê Petersburg ê Rûsyayê de jî bûbû duyemîn û fotografên wî li Moskovê û çend bajarên din ên Rûsyayê hatibûn pêşandan. Taybetmendiya berhemên Alan Roj ew e ku bi dîmeneke biçûk û kêliyekê di cih de, geh çavên zarokekê, geh ken û awirên jinekê, geh rûyê kal û pîrekê bi hostetî dikare behsa rewşa herêmê û alozî û serpêhatiyên wê bike.

***ANHA***


## Quncika Têgînan

| Bandor | Te´sîr |
|---|---|
| Gengaz | Mûhtemel |
| Girîng | Mûhim |
| Pankart (Fransî) | Di civîn û xwepêşandanan de, karton yan jî cawê gotinên kurt li gorî armancê li ser hatîn nivîsîn: *Di çalakiyê de parkata “Bimire Dagîrkerî” hat vekirin.* |
| Çalak | Kesê her tim di nava liv û tevgerê de. Jîr, jêhatî, zindî: *Miroveki çalak e* |
| Pêvajo | Ji bo demeke diyar: *Di pêvajoya şerê cîhanê de xela çêbû.* |
| Pêwendî | Têkilî |
| Plan (Fransî) | Ji bo pêkanîna karekî yan berhemekî çêkirina rê û rêbazên wê: Plana xaniyê me hatiye çêkirin. *Ji bo êrişa ser dijberê xwe plan çêkirin.* |
| Proje (Fransî) | Di gelak qadan de planeke zanistî ye ku berê hatiye amadekirin, lêçûna wê hatiye hesabkirin, dem jê re hatiye veqetandin û ji aliye rêveberiyê ve hatiye qebûlkirin: *Projeya ava bajêr dest pê kir.* |
| Protesto (Îtalî) | Dijberiya li hemberî, biryar yan jî kiryarekê: *Kurdan Peymana Lozanê protesto kir.* |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | T | A | ■ | D | O | ■ | A | L | A |
| 2 | ■ | B | A | ■ | F | Î | L | ■ | B |
| 3 | K | O | V | Î | ■ | D | E | B | Î |
| 4 | Û | R | ■ | N | A | ■ | M | A | S |
| 5 | P | Î | R | ■ | P | Z | ■ | B | ■ |
| 6 | ■ | N | ■ | S | Î | ■ | L | E | H |
| 7 | S | A | N | S | K | R | Î | T | ■ |
| 8 | A | S | A | ■ | O | ■ | M | ■ | R |
| 9 | R | ■ | L | A | ■ | P | A | P | A |

## Xaçepirs



**ÇEP-RAST**

1. Li hin cihan beramberî heşt û li hin cihan jî beramberî şazdeh welçekan e... Şaxên nebatên weke zebeş, petêx, kundir hwd. yên li ser erdê
2. Îşaret, şop... Edalet
3. Parsûyên masiyan... Alet, malzeme
4. Beyreq, sembola welatan... Baneşana keserê
5. Di dîrokê de dewleteke kurdan... Dara tirî
6. Notayek... Teref
7. Daçekek... Kurteya rêxistina rizgariya Îrlandayê... Rojek
8. Xwarina sereke... Cihê ku çûk û teyr xwe lê datînin
9. Heşt caran deh, ji heftê û nehan yek zêde... Paytexta Sûriyeyê

**JOR-JÊR**

1. Kesê ku diçe serdanê
2. (Rustemê …) Destaneke me... Bajarekî me
3. Ew nîjada spî ya ku tê bawerkirin ji kurê Hz. Nûh Sam peyde bûne; wekî kesê ku bi erebî, îbranî, asûrî û hebeşî diaxivin... Cihê herandinê
4. Ji vir û şûnde, ji niha pê de... Nalîn
5. Notayek... Mehek
6. Pêvedana bi hesinekî sincirî... Bêzar û bêziman
7. Notayek... Kar û xebat
8. Hezkiriya Derwêşê Evdî... Pêxemberek
9. Bajarekî me

# `Wê gel hesabê pir giran ji sîxur û xayînan bixwaze`

Li hemberî sûc û êrişên dewleta tirkî ya dagîrker, Masûm Hesen diyar kir ku ji bo rêgirtina li ber sîxur û êrişên dewleta tirkî, yekîtî û berxwedana gelê herêmê pêwîst e û da zanîn ku wê xayîn û sîxûr, bi biryarên gel bi cezayên giran bên darizandin. ***R-4***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 986 | 10-Tebax- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# CIVÎNA LI SOÇÎ Û PIRBÛNA ÊRIŞAN






# `Yekîtî riya yekane ya têkbirina plan û tundiya li ser jinê ye`



Jinên bakur û rojhilatê Sûriyê teqez kirin ku jinan, li bakur û rojhilatê Sûriyê cihê xwe diyar kiriye û gotin, jin bi hêz û wêrekiya xwe tevayiya zehmetî û astengiyan derbas dikin; li hemberî zilm û tundiya li ser jinê jî divê em yekîtiya xwe xurttir bikin. ***R-2***

# ‘Em bi top û bombebaranên Tirkiyê ji welatê xwe dernakevin’

Dewleta Tirkan ya dagîrker bi awayekî hovane bombebaran û êrişên xwe yên li dijî welatiyên bakur û rojhilatê Sûriyê didomine û bi taybetî zarokan dike amanc. Li dijî van êrişên hovane Hozan Yûsiv got, bila Erdogan bizane em bi top û bombebarênên wî ji welatê xwe dernekevin. ***R-5***



# ‘Divê em li gorî şerekî dijwar û demdirêj xwe amede bikin’

Esed Menan diyar kir ku armanca êrişên dagîrkeriya tirkî yên bi balafirên bêmirov skandina baweriya gelên herêmê ye û got, Tirkiye ji êrişên berfireh re xwe amade dike. Ji bo wê divê em jî ji şerekî demdirêj re xwe amad bikin û li gorî wê tev bigerin. ***R-4***

## CDK-F û TJK-F: Divê gelê Kurd bi rihê 15’ê Tebaxê dakeve qadan

Bi pêmana salvegera 38’an ya Pêngava 15’ê Tebaxê û di binê dirûşma ‘Bi Rêbertiya azad, nasnameya azad, xweseriya demokratîk Kurdistanê biparêze’ CDK-F û TJK-F’ê ji bo çalakiyên li Fransa banga tevlîbûnê kirin. ***R-3***

# Tecrûbeya şerê gel yê şoreşgerî û neteweya demokratîk

**Rêber Apo**

Di şoreşa Fransa û Rûsya û di gelek şoreşên din yên modern de, ev her du alternatîf di nava hev de pêk hatine… ***R-6***

# `Yekîtî riya yekane ya têkbirina plan û tundiya li ser jinê ye`

**Jinên bakur û rojhilatê Sûriyê teqez kirin ku jinan, li bakur û rojhilatê Sûriyê cihê xwe diyar kiriye û gotin, jin bi hêz û wêrekiya xwe tevayiya zehmetî û astengiyan derbas dikin; li hemberî zilm û tundiya li ser jinê jî divê em yekîtiya xwe xurttir bikin.**

**Darîn Silê/Qamişlo**

Têkildarî êriş, binpêkirin, desthilatdariya li ser jinan, Hevseroka Mala Êzîdiyan ya herêma Cizîrê Leyla Îbrahîm û Endama Meclisa Jinên Olî ya Konferansa Islama Demokratîk ya bajarê Qamişlo Evîn Yûsiv ji me re axivîn.

### `Dewleta tirkî hêz û pêşengiya jinê ji xwe re xeter dibîne`



Hevseroka Mala Êzîdiyan Leyla Îbrahîm bal kişand ser rola pêşeng ya jinan ji destpêka şoreşê ve û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Jinên bakur û rojhilatê Sûriyê ji bo derbaskirina astengî û zehmetiyên ku ji destpêka şoreşê ve pê re rûbirû mane rola xwe îspat kirine û heta niha jî têkoşîn û berxwedana xwe didomînin. Herwiha jin bûye pêşenga şoreşê û mînaka tevayiya cîhanê. Di her alî de jin bûye pêşeng, di aliyê siyasî, civakî, rêxistinî û fikrî de. Ji bo wê jî her tim êriş li ser jinê tên meşandin. Çimkî bi keda jinê û hêza wê şoreşek hat avakirin û heta niha jî parastina wê tê kirin û rojbiroj pêşketinên mezin tên dîtin. Dijmin jî vê yekê ji xwe re xeter dibîne û dixwaze destpêkê vê tekoşîn û pêşkeftina jinê têk bibe. Ji ber ku dizane, eger îradeya jinan bê şkandin wê destkeftiyên Şoreşê jî winda bibin. Ji bo wê jî dixwazin bi hedefgirtina jinê destkeftiyên şoreşê winda bikin.”

### `Armanc şkandina îradeya tevayiya jinên bakur û rojhilatê Sûriyê ye`

Leyla Îbrahîm got, rol û bandora jinê ya girîng ji tevayiya aliyên herêmî û navneteweyî re eşkere bûye, ji ber vê jin bûye hedefa dijmin û axiftina xwe wiha bi dawî kir: “Şideta sîstematîk ya li ser jinê, ne jinên Kurd tenê dike hedef, armanca wê şkandina îradeya tevayiya jinên bakur û rojhilatê Sûriyê ye. Dewleta Tirkan dixwaze vîna jina azad, rêxistinkirî, perwerdekirî ya ku ji bo mafê xwe û yê gelê xwe têdikoşe, bişkîne. Çi kiryar û binpêkirinên ku Tirkiye li dijî jinên Kurd, tevayiya jinên bakur û rojhilatê Sûriyê û gelên wê pêk tîne, li ber çavê tevayiya cîhan tê dîtin. Jinan tevî zilm û zordariya ku li ser wan tê kirin, têkoşîna xwe ya li dijî dagîrkeriya Tirkiyê ispat kirin.”

### `Mafê jinê ye ku azad û birûmet bijî`



Endama Meclisa Jinên Olî ya Konferansa Islama Demokratîk Evîn Yûsiv jî, bal kişand ser bêedaletî û zilma ku li ser jinên Rojhilata Navî bi giştî tê kirin, kir û wiha got: “Jin li Rojhilata Navî bi giştî, bi taybetî li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê rastî neheqî û jinavbirina nasnameyê tên. Herwiha rastî tundî û hovîtiyê ji aliyê kesên xwedî zihniyeta mêr ve tên. Ji bo azadkirina jinan, parastina mafên wan û hesabxwestin ji tevayiya kesên ku sûcan li dijî jinan dikin bê kirin, pêwîst e qanûnên tund bên derxistin û ji tevayiya kesên ku mafên jinan û keda wan winda dikin hesab bê xwestin. Çimkî mafê jinê ye ku azad û birûmet bijî.”



### `Azadiya jinê azadiya civakê ye`

Evîn Yûsiv da zanîn ku pêwîst e jin li hemberî zext, êrîş, gef, tundî, kuştin û sûcên li ser jinan yekgirtî bin û axaftina xwe wiha qedand: “Dibêjin, jin nîvê civakê ye, çawa nîvê civakê dikujin. Weke jinên bakur û Rrojhilatê Sûriyê em daxwaziya wekhevî û edaletê dikin. Herewiha zext û çewisandina li ser jinan û hovîtiyê qebûl nakin û dibêjin, eger jin azad bibe, wê civak jî azad bibe. Ji bo wê jî azadiya jinê azadiya civakê ye.”

# Festîvala Şehîd Berçem wê li Helebê were lidarxistin

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Bi dirûşma `Huner şerê hebûn û azadiyê ye` Tevgera Hilala Zêrîn ya Çand û Hunerê Jinan ya bakur û rojhilatê Sûriyê wê Festîvala yekê ya Jinan ya bi navê Şehîd Berçem li bajarê Helebê li dar bixe.**

Bi armanca pêşxistina jinan di her warî de, bi taybetî di warê çandî û hunerî de, herwiha xurtkirina peywendiyên di navbera jinên tevayiya gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de û di bin diruşmeya “Huner şerekî ji bo hebûn û azadiyê ye` Tevgera Hîlala Zêrîn bi beşdarbûna jinên tevayiya pêkhateyên bakur û rojhilatê Sûriyê yên Kurd, Ereb, Suryan û Aşûrî wê sê rojan festîvala jinan li dar bixe. Festîval dê ji 13 heta 15`ê meha tebaxê li taxa Şêxmeqsûd ya bajarê Helebê bidome.

Derbarê armanca lidarxistina festîvalê û bernameyên ku tê de werin dayîn endama komîteya amadekar ya Festîvala Şehîd Berçem, Şêrîn Xelîl ji me re axivî û diyar kir ku beşdarbûna jinan dê ji tevayiya pêkhateyên cuda yên Bakur û rojhilatê Sûriyê be, da ku jin bi hev re hezkirin û girêdana xwe ya bi çanda xwe re bidin diyarkirin.

### Armanca lidarxistina Festîvalê

Şêrîn Xelil da zanîn ku armanca wan ji festîvalê xurtkirina çand û hunera jinê yê û axaftina xwe wiha domand: “Li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo parastina çand û hunera civakê, rola jinê ya di pêşxistina çand û hûnerê de û pêkanîna projeya neteweya demokratîk, em vê Festîvalê lidardixin. Herwiha pir festivalên taybet bi vê armancê tên dar-




xistin. Di van festîvalan de jinên ji pêkhateyên cûda yên herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê kom dibin û karê, çand û hunera xwe ji civakê re didin nasîn. Lê ev festîvale teybet ji bo jinan hatiye li darxistin”

### `Ev festîval ji bo jinan derfeteke pîroz e`

Şêrîn bîr xist ku Çalakiyên Mîhrîcanê ne tenê ji bo kesên hûnermend e, di heman demê de karên çand û hunera destan yên ku dayîk û jin li malên xwe çêdikin, dê werin pêşkêşkirin. Herwiha got, Festîvalên bi vî rengî ji bo jinan derfeteke pîroz e. Çimkî jin bi riya van festîvalan de jêhatîbûn û hêza xwe dibînin û pêşkêşî civakê dikin.

Derbarê amadekariyên ku ji bo Festîvala Şehîd Berçem tên kirin û sedemên derengxistina lidarxistina festîvalê, Şêrîn got, ew çend sal in me haziriya vê festîvalê dikir. Lê ji ber rewşa heyî û şert û mercên ku herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê tê re derbas dibin, bi taybet bajarê Şehba ku rojane rastî êriş û bombebaranên dewleta dagirker tê, her salê festîval dihat sekinandin. Lê îsal me soz da ku çi bibe jî emê festîvala xwe li dar bixin û êrişan vala derxînin.

Şêrînê di berdewamiya axaftina xwe de got, Me xwest ku jinên hunermend yên ji derveyî walat jî vexwînin festîvalê, lê ji ber rewşa heyî



ya ku bê navber êrişên dewleta tirk ya faşîst li ser herêmê; dorpêç û girtina sînoran, nikarin beşdar bibin.

Endama Komîteya Amadekar ya Festîvala Şehîd Berçem ya Jinan, Şêrîn Xelîl wiha dawî li axaftina xwe anî: “Em hêvîdar in ku jin berhemên xwe bi dest bixin û di çanda civakê de bibin xwedî par. Dewleta Tirk ya dagirker bi tunekirina çandê hewl dide gel, bi taybet Jinên bakur û rojhilatê Sûriyê ji holê rake. Lê bi saya berxwedana gelê herêmê bi pêşengiya jin, tevayiya planên dagirkeriyê têk diçin.”



# Derî li Mîtaniyan vebû

**Rêbaza avakirina qesir, depoyê û herêma pîşesaziyê hema hema yek e. Li herêma pîşesaziyê firûnên ji bo helandina qîrê hatine bikaranîn, hene. Li cihekî din jî pûlên metal yên ji bo zirxên şervanan dihatin çêkirin. Ev kar hemû ji aliyê qesrê ve dihatin birêvebirin û diyar e ku bajar hiyerarşîk hatibû organîzekirin.**



Bihara par, piştî ku ava gola bendava Mûsilê kêm bû, devereke dîrokî derkete ser rûyê erdê: Zaxîkû!

Pêşî arkeolog Ivana Puljiz a li Freiburgê dîwarên ketî yên ji kevirên kerpîçê bi rêya dîmenên satelîtê dîtin. Wê di cih de xeber da arkeologê li Zanîngeha Tubingenê Peter Pfaelzner û arkeologê Kurd ê li Başûr Hesen Qasim.

Hesen Qasim bi lez berê xwe dide Kemûnê û li wir tesbît dike ku bi rastî jî kevirên kerpîçî yên dîwarekî ketî li deverê hene. Ji hingê ve yanî ji serê salê ve kolana erdê dewam dike. Bajarekî ji serdema Mîtaniyan maye, hêdî hêdî ji binê erdê tê derxistin. Bajarê Zaxîkû ji muhimtirîn û mezintirîn bajarên şaristaniya Mîtaniyan bû. Li ser 7 hektar erd hatibû avakirin û dora wê bi sûrekê hatibû girtin. Lê qesreke meliktiyê jî heye.

Peter Pfaelzner û Ivana Puljiz komeke arkeologan a kolana erdê a ji 10 kesan anîn cem hev û berê xwe dan deverê. Li cihê cihê jî Hesen Qasim bi tîmeke 50 karkeran amade bû. Du mehan wan kolana erdê dewam kir û tiştên hatine dîtin jî belge kirin. Wan dilezand ji ber ku bi biharê re, dawiya Adarê ava gola bendavê hêdî hêdî dîsa da ser deverê.

### Hêzeke mezin weke Babîl û Misrê

Esas bajar niha hatibe dîtin jî, qesra bajêr a li ser 600 metreyên bi çarçik û dîwarên wê yên mezin sala 2018´an hatibûn dîtin û kolan lê hatibûn kirin. Hingê li ser dîwarên ku bi kîlê ser wan hatibû girtin, wêneyên rengandî hatibûn dîtin.

Çanda şaristaniya Mîtaniyan têra xwe bi sir û raz e. Ji ber wê ev kolan gelekî muhim bû. Ew di nîvê hezarsala duyem a beriya mîladê de tevî Hîtît, Babîl û Misrê hêza çarem bû li Rojhilata Navîn. Ji van şaristaniyan ya herî kêm lê hatiye kolan Mîtanî ne. Împaretoriya wan ji 1550´î heta 1350 beriya mîladê ji Derya Spî heta Başûrê Kurdistanê weke xetekê dirêj dibû û navendên wê yên sereke li Rojavayê Kurdistanê bûne.

Vê kolana bi lez û bez dixwest ji bajarekî mezin ê împaretoriyê agahiyên berhev bike. Lewma heta îro tenê ji bajarên keviya împaretoriyê berhem û agahî hatibûn komkirin. Bi van agahiyan lêkoleran xwest zanibin ka bajarên Mîtaniyan çawa organîze bûne.

### Qesrê kar hemû dimeşandin

Di encama vê kolanê de lêkoleran karî planeke mîmariya bajêr a li ser 7 hektaran çêkin. Lê heta niha arkeolog nikarin texmîn bikin ka serjimara bajêr çiqas bû. Axir bajar li ser bilindahiyeke li keviya rojhilat a Dîcleyê hatibû avakirin û li dora wê sûreke mezin tevî gelek bircan hebûye. Li bakurê bajêr jî depoyeke pirr mezin, li başûrrojhilat pîşesaziya bajêr û li başûrrojava jî qesra melikî. Avahiya depoyê û herêma pîşesaziyê, wiha diyar e ku yekser ji qesrê hatine birêvebirin. Jixwe ava û stîla avakirina hersê avahiyan jî hema hema weke hev e. Li herêma pîşesaziyê firinên ji bo helandina Bîtumenê (qîreke xwezayî) hatine bikaranîn. Li cihekî din jî pûlên metal ên ji bo zirxên şervanan dihatin çêkirin. Ev kar hemû ji qesrê ve dihatin birêvebirin û diyar e ku bajar hiyerarşîk hatibû organîzekirin.

### Depoya bajarekî mezin e

Depoya hatiye dîtin jî herî kêm du qatî bûye. 16 odeyên li depoyê karîn bîn tesbîtkirin û hemû jî dirêj û zirav in.

Lê li vê derê kolana erdê nekarî bi kurahî bê kirin ji ber ku avê zû da ser vê deverê. Ji ber wê texmînî depo li ser 1400 metreyên bi çarçik hatiye avakirin. Yanî Zaxîkû navendeke muhim a tevahiya herêmê bû. Gelekî muhtemel e ku paytexta melikekî Mîtanî ê cihî be.

### Ne navendî bû

Dewleta Mîtanî ne weke Babîl yan jî Asûriyan a paşê bû. Ew ne navendî bû. Muhtemel e ku welat li wilayet û eyaletan hatibe dabeşkirin. Ji ber wê jî mirov dikare ji bo Mîtaniyan bibêje, “dewleta din” a li herêmê. Lewma ew bi rastî jî cihê bû. Yanî melikên di bin rêvebeirya împaretoriyê girêdayî şahê Mîtanî bûn, lê heta radeyekê jî xweser bûn. Muhtemel e ku civaka wan jî li gorî yên derdora wan pirrengîtir bû.

Herçî şah bûn, wan nedixwest xwedî desthilata mutleq bin weke Babîliyên cîran. Wekî din wan bi cîranên xwe hemûyan re hewl dida ne di şer de bin û siyasetên aştiyê bi Misr, Hîtît, Babîlê re bi rê ve birine.

Nimûneya ku şahê Mîtanî Tûşrata keça xwe Taduhepa bi firewnê Misrê Amenfîsê Sîyem re dide zewicandin da ku peywendiya xurt û baş



bike. Di nameyên xwe de wî firewn weke “birayê” xwe bi nav kir.

Di kolanên li bajêr de di cêran de 120 kevalên bi nivîsa mîxî hatin dîtin. Piştî jihevderxistina van kevalan dibe ku avahiya desthilata Mîtaniyan çêtir were naskirin.

***Ozgûr Polîtîka***

# Karê ciwanan bûye telefon!



Yek ji rêûresmên ku ber bi windabûnê ve diçin, çêkirina tevin, şeleme û parzûnan e. Yek ji rêûresmên ku ber bi windabûnê ve diçin, çêkirina tevn, şeleme û parzûnan e. Dayê Taybet Mijinî, li Wargeha Mexmûrê dimîne. Ev bi salan e ji bo debara xwe vî karî dike û dibêje: “Me bi saya çand û hunerê xwe nasnameya Kurdewarî parastiye û divê em hîn bêhtir xwedî li çanda xwe derkevin.”

Dayê Taybet hîn zarok e xwe hînî çêkirina tevn, şeleme, parzûn, çente û doxînan dike. Ji ber zilma dewleta Tirk a salên 90’î, dayika Taybet jî neçar dimîne ku ji gundê xwe derkeve û ber bi Başûrê Kurdistanê ve penaber dibe.

### ‘Kes elaqe bi vê çandê nake!’

Dayê Taybet da zanîn ku ew bi saya karê xwe hem debara jiyana mala xwe dike û hem jî çanda civaka xwe diparêze û wiha domand: “Em carnan ji bo zarokên xwe karê dest dikin û carnan jî ji bo firotinê. Lê wek her derê li wargehê jî zêde eleqederiyek pê nayê dayîn û zêde nayên firotin. Lê heger ev berhemên me bên firotin û hinek wan bişînin derveyî welat, mirov dikare bi rehetî pêdiviyên xwe yên aborî dabîn bikin. Ev kar, çanda pêşiyên me ye. Em bi vê çandê bi pêş dikevin û tên nasîn. Ez piranî şeleme, parzûn, çente û doxînan çêdikim. Ez gelek ji vî karî hez dikim.”

Dayê Taybet di heman demê de xebatkara Meclîsa Îştare û dibêje, ew hem karê malê, hem yê Meclîsê û hem jî karê hunerê destan bi hev re bi rê ve dibe.

### ‘Wek berê rîs peyda nabe’

Dayê Taybet bal bire ser qeyrana aborî û diyar kir ku bandora qeyrana aborî li kelûpelên wê jî bûye: “Niha kelûpelên ku em bi kar tînin bi pirranî giran bûne. Qeyrana aborî bandor li xebatên me jî kiriye. Herî zêde em dixwazin bi rîs çêkin, lê rîs peyda nabe. Berê li Navçeya Mexmûrê hebûn, lê niha nînin. Em dixwazin ciwanên xwe jî fêr bikin, lê pirraniya wan naxwazin xwe fêr bikin. Karê wan tenê bûye telefon.”

***ROJNEWS/MEXMÛR***

# Tecrûbeya şerê gel yê şoreşgerî û neteweya demokratîk

## Di şoreşa Fransa û Rûsya û di gelek şoreşên din yên modern de ev her du alternatîf di nava hev de pêk hatine…

Di tecrûbeya şerê gel ê şoreşgerî de PKK bi nêzîkatiyên xwe yên sosyalîzma pêkhatî herî zêde di warê dewletdariya netewe de tengav bû. Rastiya kontrgerîlla ya dewleta netewe ya li dijî wê şer dikir, di mijara armanc û maneya şerê şoreşgerî de rê li ber dudiliyan vekir. Ya ji vê jî xirabtir, rêbazên herdu aliyan her ku çû şibiyan hevdu. Sosyalîzma îdealîst a PKK'ê li hemberî rastiya dewletdariya netewe her ku çû tengav bû. Sedema bingehîn a pêxîrtengiya ji sala 1995'an ve her ku çû derket holê, ev rastî bi xwe bû. Gelo dewleta netewe çiqasî diyardeyeke sosyalîst e, çiqasî mumkîn e ku bê pêkanîn? Li gorî bersivdana van herdu pirsên sereke yan pêxîrtengî wê rê li ber tesfiyeyê vekirana yan jî wê bi analîzeke neteweyî ya cuda bi encam bibûya. Di vê nuqteyê de têgîna kilît a ji bo xwe rizgarkirina ji pêxîrtengiya îdeolojîk têgîna neteweya demokratîk e.

Dema ku PKK weke kom derket holê weke 'Neteweparêzan' hat binavkirin û ev ne şaş bû. Dîsa binavkirinên weke 'Rizgarîxwazên Neteweyî' û 'Artêşa Rizgariya Neteweyî' heman maneyan tîne bîra mirovan û rastiya dihat xwestin were temsîlkirin, îfade dikirin. Propagandakariya îdeolojîk a demê bi awayekî bingehîn realîteya neteweyî ya Kurd bû. Me nedixwest ku em weke netewperest bêne şîrovekirin û di bingehê vê de jî girêdana me ya xurt a bi Enternasyonala Sosyalîst re hebû. Lê me nikarîbû xwe ji realîteya neteweyî qut bikira. Ango dema ku têgîn ji netewetiyê ber bi neteweparêziyê ve şemitî, wê demê xeterî çêdibû ku bişibe îdeolojiyên nîjadperest ên ku armanca wan dewleta netewi ye. Dîsa jî di qonaxa îdeolojîk de ji me nedihat ku em van xetên tenik û tayên zirav ji hev derxin. Pêngava 1984'an şaxên xwe yên neteweyî berdan û rê li ber şertên şerê neteweyî yê şoreşgerî vekir û bivênevê vê yekê em ji nêz ve bi têgînên desthilatdarî û dewleta netewe re rûbirû kirin. Me şer bi hêzên gel dimeşand. Çi feodal û çi jî bûrjûwa di navbera me û tebeqeya jor de sînorek hebû. Gavavêtin û çûyîna me ber bi aliyê neteweyî ve têgîna şerê gel bêhukim nedikir. Li şûna netewetiya bûrjûwayê hêdî hêdî têgîneke mîna netewetiya gel pêk dihat. Dema ku em di vê çarçoveyê de li tevahiya Kurdistanê binêrin em dikarin van tespîtan bikin:

a- Li Kurdistana Iraqê ji serê salên 1920'an ve, nexasim piştî parçebûna di salên 1920'an de li cem tebeqeya jor liv û lebatên ku em dikarin weke milliyetgiriya paşvemayî bi nav bikin bi lez bûn. Tevger ji çarçoveyeke teng a rewşenbîran derketibû û bûbû xwedî xisleteke girseyî, lewma vê yekê wê milliyetgirî bi lez bikirana. Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn îlana PDK'ê li ser riya milliyetgiriyê gaveke girîng îfade dike. Komara Mahabadê weke tecrûbeya pêşî ya mîllî balê dikişîne ser xwe. Şerê gerîlla yê di sala 1961'ê de li Kurdistana Iraqê derket holê, li tevahiya Kurdistanê hestên milliyetgir hişyar kirin û ew bi hêz kirin.

Tevî têkçûna tevgerê û bi sedema nakokiyên hundir parçebûna wê, bi xisleta federe be jî bûyeran ew neçar kir ku ber bi desthilatdariyeke neteweparêz a Kurd, ber bi dewletdariyeke netewe ve biçe. Dewletdariya netewe ya Kurd a bi desteka Emperyalîzm û Siyonîzmê, bi kêmanî bi qasî dewletdariya netewe ya Îsraîlê ya li Filistînê weke modeleke xwedî girîngî di dewrê de hiştin. Ev xusûs gelekî girîng e. Çawa ku biryar didin, dewleta netewe ya Tirk, ya rastî, şoreşa komarê ji salên 1923'an ve weke dewletekê û ji salên 1925'an ve jî bi xisletên dewleta netewe weke Proto-Îsraîlekê difikirin (Di vê mijarê de hewcedarî bi lêkolînên berfireh heye). Bi derengî be jî piştî salên 1945'an jî bi pêşengiya PDK'ê bi heman awayî biryara modeleke Kurd a Proto-Îsraîlê didin. Cudahiya di navberê de zeman e û xisletên hêzan ên cuda yên mîllî ne. Ango ji bo paşerojê û ji bo ewlekariya Îsraîlê weke Proto-Îsraîlekê hewcedarî bi avakirina dewletên netewe yên Kurd û Tirk heye. Dewleta netewe ya Tirk a Proto-Îsraîl bi CHP'ê pêk anîn, li cem Kurdan jî bi PDK'ê dewletoka netewe ya Proto-Kurd pêk tînin.

Ez difikirim ku paşê bi awayekî berfireh li ser vê mijarê rawestim...

b- Neteweya demokratîk ne bi tenê têgîn e, weke rastî jî berbiçav dibe. PKK'ê di dema qonaxa koma îdeolojîk de têkoşîna li dijî milliyetgiriya neteweya bindest û serdest meşandî, di çarçoveya tecrûbeya şerê gel ê şoreşgerî de dîsa li dijî herdu dewletdariyên netewe weke têkoşîna neteweya demokratîk dewam dike. Dewletên netewe yên serdest bi tenê bi hêzên zorê yên eşkere yên li ber çavan û hevkarên xwe yên bi peran hewl didin li ser piyan bimînin, lê tevî milliyetgiriyên li dora wê hemûyan, tevî destekdarên wê yên hundir û derve hemûyan, tevgera neteweya demokratîk wê dorê li dewletdariya netewe ya Kurd bigire û wê tecrîd bike. Di Şoreşa Kurdistanê de cara pêşî ye ku alternatîfa dewleta netewe û alternatîfa neteweya demokratîk hewl didin bi hev re rol bigirin.

Di Şoreşên Fransî û Rûs de û di gelek şoreşên din ên modern de ev herdu alternatîf di zikhev de pêk hatine. Di Şoreşa Kurdistanê de jî ev herdu alternatîf ji hev cuda dibin, di navbera wan de xeta îdeolojîk, polîtîk û çalakiyê zelal dibe û ev bûyereke dîrokî ye. Heta niha di tevahiya şoreşên modern de yan bi temamî serdestiya tebeqeya jor an jî berevajiyê wê serdestiya tebeqeya jêr xwedî hukim bû. Dema bi hev re bûn, yan jî wexta ji hev cihê bûn, sînorên zelal di navbera xwe de danedianîn. Têkoşîna yek a din tesfiye bike kiribûn rêbaza sereke ya têkoşînê. Ji bilî bi hêz kirina modernîteya kapîtalîst, ev rewş bi kêra tiştekî din nedihat. Hem di navbera herdu çînan de hem jî di navbera herdu neteweyan de têgihiştineke şaş a têkoşînê hebû. Herçiqasî di tecrûbeya şerê gel ê şoreşgerî yê Kurdistanê de ev rewşa şîlo ji serî ve bişibe mînakên beriya xwe jî têkoşîna zêde û dijwar di encamê de cudabûn bi lez û zelal kir. Di vê pêvajoyê de PKK ne bi tenê ji dewletdariya netewe ya sosyalîzma pêkhatî bihurî, bi awayekî îdeolojîk ji dewletdariya netewe ya bûrjûwaziyê ya ji nava sosyalîzmê derketî jî bihurî ango pirsgirêka netewe ji pirsgirêka avakirina dewleta netewe derxist û li şûna wê modeleke di kategoriya neteweya demokratîk de ava kir ango gel bi xwe, xwe weke neteweyeke azad û wekhev pêk tîne. Kategoriya neteweya



demokratîk hem ji aliyê çînî ve hem jî ji aliyê çareseriya pirsgirêka neteweyî ve kir modeleke alternatîf. Neteweya demokratîk kir hêmana herî girîng a modernîteya demokratîk (Hêmanên din ev in: Îndustriya ekolojîk û ekonomiya kominal a ku karê li derve dihêle). Ji dewletdariya netewe ya Hegelî ku ji sedûpêncî salî zêdetir li serê sosyalîzma zanistî bû bela bihurî û li sosyalîzma herî nêzî zanistê rê vekir. Bi vî awayî di avakirina sosyalîzma felsefî, zanistî, exlaqî û estetîk de alîkariya herî girîng kir.

c- Tevî vê alîkariya dîrokî ya di qada teorîk de, di qada pratîkî de, di rewşa berbiçav a rastiya civakî ya Kurd de pêkhatina neteweya demokratîk û modernîteya demokratîk bi lez bûn. Sînorên di navbera Kurdên çar parçeyan de bi pêkhatina neteweya demokratîk bêkêr bûn. Sînor ji bo dewletên netewe her tişt in, lê ji bo neteweya demokratîk ketin rewşa ne tiştekî. Neteweya demokratîk di zêhnê gel de weke şoreşa herî girîng a bîreweriyê hat hûnandin, xweseriya demokratîk jî weke şoreşa herî girîng a bi gewdebûnê li her parçeyî hat avakirin. Çerxên mekanîzmayên qirkirina çandî ya dewletên netewe yên Tirkî, Îran, Iraq û Sûrî bi giranî vala digerin û her beşê gelê Kurd ê li van parçeyan, bûn parçeyekî avaker û afirîner ê neteweya demokratîk. Şerê gel ê şoreşgerî ne bi tenê qirkirina çandî ya hegemonya dused salên dawî ya modernîteya kapîtalîst û komploya dewletdariya netewe ya ajan derxist holê, jê hat ku weke alternatîf li her parçeyî neteweya demokratîk di zêhnê her mirovê Kurd ê durist de û di bedena her civaka Kurd de pêk bîne û ev serketineke mezin e. Li ser vî bingehî, di serî de gelên cîran ango gelên Tirk, Ereb û Fars, çandên hindikayiyên din û gelên tesfiye bi serê wan de hatine (Ermenî, Grek, Suryanî û yên wekî wan) ji bo weke koma neteweyên demokratîk di nava xwe de bi dostanî piştgiriya hev bikin û bi rola pêşengiyê ya di avakirina modernîteya demokratîk de rabin û vê serketina dîrokî li nava herêmê û dinyayê bi pêş bixin, derî bi temamî vekirine.

Rêber Apo
Ji Parêznameya: 'Parastina Kurdên Di Nava Pencên Qirkirina Çandî De' (cilda 5)



# CDK-F û TJK-F: Divê gelê Kurd bi rihê 15'ê Tebaxê dakeve qadan

## Bi pêmana salvegera 38'an ya Pêngava 15'ê Tebaxê û di binê dirûşma 'Bi Rêbertiya azad, nasnameya azad, xweseriya demokratîk Kurdistanê biparêze' CDK-F û TJK-F'ê ji bo çalakiyên li Fransa banga tevlîbûnê kirin.

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Konseya Kurdan ya Demokratîk ya li Fransa (CDK-F) û Tevgera Jinên Kurd ya li Fransa (TJK-F), bi pêmana salvegera 38'an ya Pêngava 15'ê Tebaxê daxuyaniyeke nivîskî weşandin û bang li gelê Kurd yê li Fransa kirin ku bi girseyî tevlî çalakiyan bibe.

**'15'ê Tebaxê tê wateya azweriya berxwedan û azadiyê ya li ser xeta Apoyî'.**

CDK-F û TJK-F'ê di daxuyaniyê de diyar kirin ku 15'ê Tebaxê ji bo gelê Kurd tê wateya vejînê û wiha gotin: "Divê em li dora nirxên bi têkoşîna 38 salan hatine avakirin, kom bibin. Di şexsê fermandarê nemir Egîd de, hemû şehîdan bi bîr tînin û em salvegera pêngava 15'ê Tebaxê pîroz dikin. Pêngava 15'ê Tebaxê li hemberî her cure tasfiyekariyê, tê wateya azweriya berxwedan û azadiyê ya li ser xeta Apoyî."

**'15'ê Tebaxê pêngava serfiraziyê ye'**

CDK-F û TJK-F'ê balkişand ser girîngiya meha Tebaxê û wiha gotin: "Meha Tebaxê di dîroka gelê Kurd de meha pêngav û serfiraziyê ye. Ji ber ku li hemberî rejîma faşîst û leşkerî ya 12'ê Îlonê pêvajoya ku bi çalakiyên Dihê û Şemzînanê yên di 15'ê Tebaxa 1984'an de hate destpêkirin, tê wateya pêngava şoreşger ya gerîla û serfiraziya wê."

CDK-F û TJK-F'ê bang li gelê Kurd kir ku bi rihê 15'ê Tebaxê dakeve qadan û daxuyanî wiha qedandin: "Piştî 38 salan di salvegera pêngaveke wisa de, şertên tecrîdê yên li ser Rêber Apo giran dibe û li hemberî gelê Kurd jî şer zêdetir dibe. Dem hatiye ku em bi ruhê 15'ê Tebaxê dakevin qadan, Kurdistanê biparêzin, bi şîara Rêbertiya azad, nasnameya azad û xweseriya demokratîk xwedî li çalakiyan derkevin.




Em bang li Kurdên li Fransayê dikin ku bi girsekî tevlî çalakiyan bibin."

**Çalakî di 13'ê Tebaxê de dest pê dike**

Li Fransayê wê çalakî di 13'ê Tebaxê de dest pê bikin. Li Parîsê wê di 13'ê Tebaxê de saet di 17.00'an de li Gare Du Nordê çalakî werin destpêkirin û li qada Stalîngradê jî wekî mîtîngê bidome. Di heman demê de wê li Marsîlya, Rennes, Bordeaûx, Strasboûrgê jî çalakî werin kirin.

# Tevgera Hilala Zêrîn: Em bi tundî êrişên dewleta tirkî şermezar dikin

**Tevgera Hilala Zêrîn ya Çanda Jinan ya bakur û rojhilatê Sûriyê bi tundî êrişên dewleta tirkî ya dagirker şermezar kirin û diyar kir ku ew ê tevî şêniyan li hember hewlên dewleta tirkî ya dagîrker yên têkbirina ewlehî û îstîqrara li herêmê bisekinin û banga girtina qada hewayî ya herêmê kir.**

Tevgera Hîlala Zêrîn ya Çanda Jinan ya bakur û rojhilatê Sûriyê bi daxuyaniyekê êrişên bênavber ên dewleta tirkî ya dagîrker şermezar kirin û bêdengiya navneteweyî rexne kir.
Di daxuyaniyê de ev hate gotin:
"Heta kengî wê civata navneteweyî di xewê de be û rêxistina mafên mirovan û NY'yê wê cîhana xwe ya texmînan de dûrî rewşa heyî û binpêkirinên li dijî mafên mirovan be?
Ew yek jî bi taybet piştî pêşdeçûna mezin a medyayên dîjîtal û bûyer bi pêşbîniyên aliyên diyar ve nehatin girêdan, mîna binpêkirinên dermirovî û destwerdana dewleta tirkî bi serkêşiya Erdogan û AKP'ê li xaka Sûriyê bi giştî û herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê pêk hatin. Dewleta tirkî bi rêya balafirên bêmirov zarok, jin û temenmezinan dike armanc.
Armanca dewleta tirkî ya dagîrker îstîqrar pêk neyê, temenê rêxistinên terorîst mîna DAIŞ'ê û hevalbendiyên wê dirêj bibe, piştî ku YPJ, YPG û QSD'ê tevayî planên wan yên bêîstîqrariya li herêmên Rojhilata Navî, bakurê Sûriyê û rojhilatê wê bi taybet, têk birin.
Her kes têkiliya xurt ya di navbera rêxistinên terorîst û Erdogan de dizane. Ew bi hemû cureyan destekê dide ku xewna xwe ya desthilata Osmaniya Nû vegerîne. Bila Erdogan, hemû çete û alîgirên wî bizane ku em destekê didin gelê xwe û em ê li hember hewlên wan ên dagirkriina herêmên me ku demografiya herêmê biguherînin bisekin, mîna li Efrîn, Serêkaniyê, Girê Spî û herêmên din dike.
Em bi tundî binpêkirin û sûcên ku hikumeta AKP'ê ya bi serkêşiya Erdogan li dijî herêmên me yên ewle pêk tîne şermezar dikin, her wiha bêdengiya navneteweyî li hember van kiryaran şermezar dikin.
Em bang li NY'yê, rêxistina mafên mirovan, hemû hêzên û rêxistinên têkildarî mafên mirovan dikin ku bi erkên xwe yên exlaqî û dîrokî rabin û destekê nedin desthilata tirkî û çeteyên wê, da ku karesat li dijî herêmên me pêk neyên. Ji ber wê bandoreke giştî li rewşa Sûriyê bike.
Em bang dikin ku qada hewayî ya herêmê li pêş balafirên şer û yên bêmirov bigirin ku êrişên dewleta tirkî bi dawî bikin."
***ANHA***

# Meclisa Leşkerî ya Minbicê bîlançoya 10 rojan ya êrişên li ser Minbicê eşker kir

Meclisa Leşkerî ya Minbicê bîlançoya 10 rojan ya topbarana artêşa Tirkan ya dagîrker û çeteyên wê li dijî gundên Minbicê eşkere kir. Meclisê teqez kir ku gundên bi welatiyan dagirtî hatin tobparankirin.

Navenda Ragihandinê ya Meclisa Leşkerî ya Minbicê daxuyaniyek da, tê de bîlançoya êrişên dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê li dijî gundên Minbicê eşkere kir. Di daxuyaniyê de ev agahî hatin parvekirin:

"Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên Mertala Firatê ji beriya 10 rojan ve binpêkirinên xwe didomînin. Dagirkeran gundên Ereb Hesen, Mihsenlî, Ewn Dadet, Toxar, Hoşeriyê, Cat, Seyadê, Yalinlî, Kawiklî, Kor Hiyûk û Boxa topbaran kirin.

Di 10 rojên dawîn de ev gund bi 81 topên hawanê û bi çekên giran û navîn ji baregehên artêşa tirkî ya dagîrker yên li gundên Toxar Kebîr, Şêx Nasir, Yaşilî, bê ser û ber hatin topbarankirin. Top li kêleka malên sivîlan dikevin û topbaran rojane dewam dike. Hêjayî bibîrxistinê ye ku artêşa Tirk a dagirker binpêkirinên xwe li dijî gundên bi welatiyan dagirtî didomîne, bi taybet gundên li hember eniya şer ku tires di nava xelkê de belav dike."
***ANHA***

# ‘Divê em li gorî şerekî dijwar û demdirêj xwe amede bikin’

Esed Menan diyar kir ku armanca êrişên dagîrkeriya tirkî yên bi balafirên bêmirov şkandina baweriya gelên herêmê ye û got, Tirkiye ji êrişên berfireh re xwe amad dike. Ji bo wê divê em jî ji şerekî demdirêj re xwe amad bikin û li gorî wê tev bigerin.

**Mihemed Xanim/Qamişlo**

Li ser zêdebûna êrişên dagîrkeriya tirkî yên li dijî herêmên Rêveberiya Xweser, Endamê Meclisa Giştî Ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Esed Menan, ji me re axivî.

Menan diyar kir ku ji sala 2015’an ve gefên Erdogan li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê qut nebûne û wiha got: “Dagîrkeriya tirkî li ser xaka Sûriyê sê êrişên mezin kirin. Di êrişa yekê ya sala 2016’an de, herêma Ezaz, Cerablûs, Marê û Raî dagîr kirin. Xwest bi dagîrkirina vê qadê herêma Efrînê ji bakur û rojhilatê Sûriyê qut bike û di dorpêçê de bihêle. Êrişa duduyan 2018’an çêbû. Di vê êrişê de Efrîn hat dagîrkirin û gelek komkujî çêbûn. Êrişa dagîrkeriyê ya sisiyan 2019’an bû. Dagîrkeriyê Serê Kaniyê û Girê Spî dagîr kirin. Îro jî Erdogan hewl dide ku êrişên nû bike û seranserê herêmên Rêveberiya Xweser dagîr bike.”

**’Hêzên li ser xaka Sûrî bi Tirkiyê re tev hevkarên sûcên dijmirovî ne’**

Menan bal kişand ser êrişên dagîrkeriya tirkî yên bi balaferên bêmirov û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Tirkiyê, ji bo êrişên bi balafirên bêmirov destûr ji Amerîka, Rûsya û Îranê girtiyê. Hêzên li ser xaka Sûriyê ne û xwe bêdeng dikin bi hevkarên sûcên Tirkiyê yên dijmirovî ne.”

**’Armanca dagîrkeriyê tirsandina gelên herêmê ye’**

Menan da xuyakirin ku armanca dagîrkeriya tirkî tirsandina gelên herêmê ye û wiha got: “Dagîrkeriya tirkî rayedarên QSD’ê, kesayetên welatparêz û pêşengên şoreşa Rojava dike amanca êrişên xwe. Herwiha di van êrişan de sivîl jî dibin amanc. Dagîrkerî dixwaze tirsê bixe dilê gelên herêmê. Tirkiye li herêmên dagîrkirî bi awayekî sîstematîk guhertina demografîk dike. Li wan herêman ziman û pereyên xwe dide bikaranîn. Herwiha ala wê tê bilindkirin. Li dibistanan minhaca xwe pêk tîne. Her herêa dagîrkirî bi bajarekî Tirkiyê ve tê girêdan. Li gorî kiryarên wê, tê xuyakirin ku dixwaze herêmên dagîrkirî tevlî xaka xwe bike”

**’Divê gel xwe ji şerekî demdirêj re amade bike’**

Endamê Meclisa Giştî Ya Partiya Yekîtiya Demokratîk ( PYD) Esed Menan da zanîn ku erdngariya Tirkiyê ji bo hêzên navneteweyî girîng e û axaftina xwe wiha qedand: “Tirkiye andama NATO ye û li herêmê armancên Amrîka û hêzên Rojavayî pêk tîne. Ji ber wê ev hêz çavên xwe ji kiryarên wê re digirin. Dema dawî di navbera rayedarên Tirkiyê û yên Rûsiya de gelek hevdîtin çêbûn. Rûsya dixwaze peymana Adana nû bike û di navbera hikumeta Şamê û Tirkiyê de lihevhaneke nû çêke. Tirkiye, ji bo êrişeke nû ser bakur û rojhilatê Sûriyê xwe amade dike. Dive Rêveberiya Xweser li hemberî planeke wisa gel amade bike. Herwiha divê gel jî xwe li gorî Şerê Gel yê Şoreşgerî amade û perwerde bike û berxwedanê bike pêngava rizgarkirina herêmên dagîrkirî.”

Hejayê bîraninê ye ku Piştî têkçûna DAIŞ’ê li bakur û rojhilatê Sûriyê, dewleta tirkî



ya dagîrker êrişan xwe yên ser herêmê zêde kirin. Dagîrkerî bi balafirên bêmirov êriş dike û gelek komkujiyan dike. Hin ji wan êrişan wiha ne:
2’yê Kanûna 2019’an, bi balafireke bêmirov êrişî navçeya Til Rifetê kir. Di êrişê de piraniya wan zarok 9 kes şehîd bûn û 10 sivîl jî birîndar bûn.
20’ê Cotmeha 2020’an balafirên keşfê yên bêmirov yên biçek gundê Mezrê û Dêrika Beravê yên Dêrikê bombebaran kirin û 2 welatiyên sivîl şehîd bûn.
23’yê Hezîrana 2020’an balafirên bêmirov li gundê Helincê yê Kobanê malek bombebaran kirin û 3 jinên tê de şehîd bûn.
9’ê Mijdara 2021’ê li taxa Hilêliyê ya Qamişlo balafira bêmirov êrişî wesaitekê kir, di êrişê de welatparêzê bi navê Yûsiv Gulo û 2 neviyên wî şehîd bûn.
25’ê Hezîrana 2021’ê balafireke bêmirov li Taxa Şehîd Peyman ya Kobanê bombe li malekê barandin. Di êrişê de 5 endamên Ciwanên Şoreşger şehîd bûn.
1’ê Nîsana 2022’yan wesaita ku hunermend Ferhad Merdê û 2 hevalên wî tê de bûn, li nêzî Tirbespiyê bû amanca êrişa bombeyî ya balafira bêmirov. Di êrişê de ajokar şehîd bû, Ferhad Merdê û hevalên wî birîndar bûn.
22’yê Tîrmeha 2022`yan sê fermandarên YPJ’ê di êrişa belafireke bêmirov de şehîd bûn.
Dagîrkeriya tirkî 27’ Tîrmeha 2022`yan li navçeya Êyn Îsa, bi balafireke bêmirov êrişî erebeyeke Hêzên Ewlekariya Hundrî kir û çar endamên wê şehîd bûn.
4`ê Tebaxa 2022’an bi balafireke xwekuj ya bêmirov navenda Til Rifetê kir amanc, 6 ji wan zarok 9 welatî birîndar bûn.
Herî dawî balafireke bêmirov 6’ê Tebaxa 2022’yan li taxa Sînaa ya Qamişlo êrişî seyareyekê kir. 2 zarok 4 welatî şehîd bûn û gelek welatî jî birîndar bûn. Herwiha gelek ziyan jî gihişt mal û milkên welatiyan.

# `Wê gel hesabê pir giran ji sîxur û xayînan bixwaze`

**Dilîn Ehemd-Qamişlo**

**Li hemberî sûc û êrişên dewleta tirkî ya dagîrker, Masûm Hesen diyar kir ku ji bo rêgirtina li ber sîxur û êrişên dewleta tirkî, yekîtî û berxwedana gelê herêmê pêwîst û da zanîn ku xayîn û sîxûr, wê bi biryarên gel bi cezayên giran bên darizandin.**

Êrişên dewleta tirkî ya dagîrker li ser bakur û rojhilatê Sûriyê rojbiroj pirtir dibin. Di van êrişan de bi teybetî zarok dibin amanc. Ev rewş hêrs û bertekên gel zêde dike.

Gel bi helwesta xwe diyar dike ku dewleta tirkî bi êrişên xwe, dixwaze vîna gelê herêmê bişkîne. Mîna êrişa dawî ya ser taxa Sînaa ya bajarê Qamişlo ku di encamê de du zarok yên bi navê Ehmed û Aheng şehîd bûn. Herwiha welatiyê bi navê Şemdîn û endamê saziya rêxistinkirina leşkerî ya bajarê Amûdê Rûxwaz, şehîd bûn. Li hemberî van êrişan, gelê herêmê li ber xwe dide û têkoşîna xwe xurttir dike.

Li dijî êrişan bi taybetî ji bo qedexekirina belafiran li esîmanên bakur û rojhilatê Sûriyê, bi sedan şêniyên bajarê Qamişlo, partiyên siyasî, tevgerên jinan û saziyên sivîl (8/8/2022) li çerxerêya Basil ya başûrê Qamişlo kom bûn û berê xwe dan navenda hêzên Rûsya ya li balafirgeha Qamişlo, da ku helwesta xwe ya li dijî van êrişan zelal bikin û bang kirin ku erkê xwe yê mirovî bi cih bînin.

**`Divê asîmanê bakur û rojhilatê Sûrî ji balafirên dewleta tirkî were girtin`**

Hevserokê Meclisa Malbatên Şehîdan ya bajarê Qamişlo Masûm Hesen destpêkê ji tevayiya malbatên şehîdan re



sersaxî xwest. Masûm diyar kir ku, rojane êriş li ser walatiyan ji aliyê dewleta tirkî ve tên kirin. Ji bo wê divê asîmanê herêmê ji balafirên dewleta tirkî re, were qedexekirin. Masûm axaftina xwe wiha domand: “Rojana êriş li ser me de tên kirin. Armanca dewleta tirkî ya dagîrker ji êrişan ew e ku, vîna gelê me bişkîne û deskeftiyên me yên bi xwîna şehîdan hatîn bidestxistin têk bibe. Herwiha dixwaze bi êrişên xwe demografiya herêmê biguherîne. Ji bo wê banga me ji hêzên liherêmê heye ku erkê xwe pêk bînin. Herwisa divê asîmanê me ji balafirên êrişê re were qedexekirin.”

Masûm Hesen got, em ti carî li ser soza ku me bi şehîdên xwe re dayî, venagerin.

Hesen wiha dirêjî da axaftina xwe: “Bi rihê berxwedan û têkoşîna şehîdên xwe, emê li hemberî dijminê xwe bisekinin. Emê rê nedin ti hêzên ku aramiya herêma me têk bibin. Herwiha banga me ji bo çi kesê mafnas û rêxistinên ku piştgiriya gelan dikin ew e ku, li keda deh salan ya gelê Rojava xwedî derkevin. Hêviyên me hene ku her mirovê azadîxwaz piştgiriya şoreşa Rojava bike.”

**`Nebin kujerê birayên xwe`**

Li ser sîxurên dewleta tirkş ya dagîrker, Hevserokê Meclisa Malbatên Şehîdan ya bajarê Qamişlo Masûm Hesen diyar kir ku kî li gelê xwe xiyanetê bike, wê ji aliyê gel ve pir giran bê cezakirin û wek malbatên şehidan êdî wê hesabên giran ji van sîxuran bixwazin û axaftina xwe qedand: “Êdî li ber çavan tê dîtin sîxurên dewleta tirkî ya dagîrker ku di nava me de dijîn, dibe sedema şehîdxistina ciwan û zarokên me. Ji vî alî ve divê gelê me hişyar be, divê bi siyaseta dijmin neyê xapandin û hesab ji xayînan bixwaze. Bila em kêfa dijminê xwe li xwe neynin. Ji bo wê banga min ji gelê azadîxwaz bi taybetî Kurdên li her çar perçeyê Kurdistanê re ew e ku, li keda hevalan û xwîna şehîdan xwedî derkevin. Têkoşîna xwe ya li hemberî dijmin xurttir bikin herwiha li şoreşê xwedî derkevin xewn û xeyalên şehîdên xwe pêk bînin. Ji bo rê li ber êrişan were girtin ya herî girîng û pêwîst, yekîtî ye.”



# ‘Em bi top û bombebaranên Tirkiyê ji welatê xwe dernakevin’

Dewleta Tirkan ya dagîrker bi awayekî hovane bombebaran û êrişên xwe yên li dijî welatiyên bakur û rojhilatê Sûriyê didomine û bi taybetî zarokan dike amanc. Li dijî van êrişên hovane Hozan Yûsiv got, bila Erdogan bizane em bi top û bombebarênên wî ji welatê xwe dernekevin.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Di 6`ê Tebaxê de dewleta Tirkan ya dagîrker careke din bi balafira bêmirov, erebeyek li taxa Sînaa ya rojhilatê bajarê Qamişlo bombebaran kir. Di encamê de 4 welatî ku 2 ji wan zarok bûn, şehîd bûn. Mîna vê bombebaranê li seranserê herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê tên kirin. Tirkiye rojane herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dike amanc û her carê jî welatî şehîd dibin.

Têkildarî êrişa dewleta Tirkî ya ser taxa Sînaa û zêdekirina bikaranîna balafirên bêmirov, kesên ku di êrişê de birîndar bûne û hevalên wan ji me re axivîn û diyar kirin ku tişta dewleta Tirkî ya faşîst dike dijmirovî ye. Herwiha dan zanîn ku, wê hesabê van êrişan bixwazin û wê tola zarokên xwe ji dagîrkeriya Tirkî hilînin.





Elî Hisên yê 45 salî ku di êrişa dagîrkeriya Tirkî ya li dijî taxa Sîna ya Qamişlo de birîndar bûbû, li ser bûyerê û şehîdbûna kurê xwe Ehemed Hisên û biraziyê xwe Aheng Hisên axivî û wiha got: “Ez jî li cihê bûyerê hazir bûm, lê hema ji mirinê filitîm. Ez di serî û di laşê xwe de birîndar bûm. Li sînaa dikaneke min ya firotina parçeyên erebeyan heye. Kurê min û biraziyê min jî bi min re kar dikirin. Ew jî di êrişê de hazir bûn, lê mixabin di dema êrişê de jiyana xwe ji dest dan. Dema ku êriş çêbû, min dixwest ser lingê xwe bisekinim û Aheng û Ehmed ji nava agir derxim, lê min nikarî.”

**`Emê tola zarokên xwe ji dewleta tirkî ya kujer hilînin’**

Elî Hisên bi dilekî germ û şewitî teqez kir ku wê tola her du zarokên xwe bistîne û wiha pê de çû: “Dewleta tirkî pir har bûye û şûrê xwe li dijî me tûj kiriye. Rojane zarok, jin û yên temenmezin dike hedefa xwe. Ma zarokên me çi guneh kirine. Ma Ehmed û Aheng çi ji Tirkiyê kiribûn. Zarokên me ti guneh nekirine tenê xwesteka wane ku bi aştî û aramî li bajarê xwe bijîn. Bila dengê min bigihîje her kesî û bila Tirkiye baş bizane ku heta em tola zarokên xwe nestînin em ranawestin.”

**`Em ti carî tine nabin`**

Hevalê Elî Hisên yê bi navê Hozan Yûsiv jî êrişên dewleta Tirkî ya dagîrker û sûcên li dijî welatiyan şermezar kir û da xuyakirin ku, Tirkiyê bi van êrişan tevayiya pîvanên exlaqî û mirovî binpê dike û got, dewleta faşîst ku bûye belaya serê gelan, dixwaze me tine bike. Ji bilî tinekirina me jî tiştekî din qebûl nake. Ji bo ku me tine bike her rengê hovîtiyê bi kar tîne. Lê çi bike jî, em tine nabin wê zarokên me li şûna me têkoşînê bikin.

**`Em bi top û bombebaranên Tirkiyê ji welatê xwe dernakevin`**


Hozan di dewama axaftina xwe de got, dewleta Tirkî ya dagîrker bi van êrişan dixwaze welatî ji mal û milkên xwe dûr bikevin û neçarî koçberiyê bibin. Herwiha hewl dide tirsê di nava welatiyan de belav bike û ewleyiya herêmê têk bibe û tevliheviyê derxe. Bila Erdogan bizane em bi top û bombebarênên wî yên bi balafirên bêmirov ji welatê xwe dernekevin.

**`Divê qada hewayî ya herêmê were girtin`**



Hozan Yûsiv di dawiyê de bal kişand ser pêwîstiya qedexekirina balafirên bêmirov û ev li axaftina xwe zêde kir: “Divê qada hewayî ya herêmê were girtin, da ku hovîtiya Tirkiyê jî bê sekinandin. Eger balafir werin qedexekirin Tirkiye êdî nikare êrişî herêmê bike. Çimkî hêza wê nîne ku rûbirû şerê me bike. Ji bo wê jî em bang dikin ku hêzên navneteweyî yên qaşo ji bo ewleyiya herêmê li ser xaka me tev digerin, qada hewayî ya balafiran bidin sekinandin, da ku em jî bizanin ka ev hêz rastî çima li ser vê xakê tev digerin!”

## Divê Erdogan ji sûcê qirkirinê bê darizandin



**Zekî BEDRAN**

Faşîzma Erdogan li Kurdistanê rijandina xwînê û kokujiyan didomîne. Heyîn û neyîna Tirkiyê tevê ji bo tinekirina Kurdan û temamkirina qirkirinê bi kar tîne. Di vê rê de gihat asta sûcên dijmirovî û çavkaniya xeterê. Bi rêxistinên weke DAIŞ`ê û El Nusra re itîfaq kir. Niha jî li herêmên dagîrkirî ev rêxistin hespê xwe dibezînin. Ji bo rêxistinên sûc herêmên ewle hatin afirandin. Li herêmên weke Efrîn, Cerablûs û Serê Kaniyê yên dagîrkirî, bi dehhezaran çete hatine birêxistinkirin û êrişî gel dikin. Artêşa tirkî hêzeke mezin biriye Idlibê û rejima El Nusra ava kirî diparêze. Erdogan bi Îran û Rûsya re li deverên weke Astana tên cem hev û daxuyaniyên hevbeş didin. Qadşo dibêjin em yekbûna siyaset û erdê Sûriyê diparêzin. Henekên xwe li gelan dikin. Tirkiyê Sûriye dagîr kiriye. Bi dagîrkirinê têr nabe. Li herêmên dagîrkirî bi nifûsê dilîze. Qirkirina neteweyî dike. Welatiyên xwediyên cih derdixe yên nêzîkî xwe tîne li şûna wan bi cih dike. Weke din ji wan bi dehhezaran kirine leşker. Wan li hemberî rêveberiya amê amade dike. Navê wê jî kiriye Artêşa Neteweyî ya Sûriyê. Rêveberiyeke hember ava kiriye.

Baş e ev yekbûna siyaseta Sûriyê û erdê wê li hemberî kê diparêzin. Bêguman li hemberî Kurdan û herêmên xweser. Kurd û Ereb welatiyên Sûriyê ne. Weka Tirkan ji derve nehatine Sûriye dagîr nekirine. Li herêmên ji DAIŞ`ê rizgar kirin xwe bi rêxistin kirine û ewlekariya xwe diparêzin. Modela rêveberiyeke demokratik ava kirine. Bernameyeke wan ya avakirina dewleteke cüda û cudabûna ji Sûriyê nîne. Tersê wê dibêjin bi navcîtiya Rûsya em amade ne bi Sûriyê re hevdîtinê bikin û di çarçoveyeke demokratik de em ji lihevhatinê re amade ne. Herwiha dibêjin me yekbûna erdê Sûriyê parastiye û diparêzin. Herwiha dibêjin em di pîvanên demokrasiyê de li hev bikin û li hemberî çeteyan têkoşîneke hevbeş bidin. Digel wê em bibin yek dawiyê li dagîrkeriya dewleta tirkî jî bînin.

Faşîzma Erdogan çavkaniyên Tirkiyê yên aborî qedantin. Sîstema dadê roxand. Destkeftiyên demokrasiyê ji holê rakirin. Azadiya fikir û çapemeniyê tine kir. Dewlet bi rastî bû çete. Li sere çeteyan jî Erdogan û Bahçelî ne. Herwiha êrişî Iraq û Sûriyê dikin û xwezaya wê xirab dikin. Gel didin koçkirin û ji kedê qut dikin. Hebûna wan talan dikin. Bi êrişên dewamî gelan di binê gefê de digirin û bêaramiyê geş dikin. Bi kurtayî êrişên Tirkiyê yên ser cîranên wê û israra wê ya di şer de herêmê tevê dixe nava bêaramiyê û gelan dike mehkûmê birçîbûn û koçberiyê.
Piştî civîna Tehranê Erdogan êrişên ser Rojava pirtir kirin. Bi taybetî bi SÎHA derketin nêçîra mirovan. Êrişa ser Tir Temir, Eyn Îsa, Til Rifet û Şehba zêde bû. Bi dehan sivîl hatin kuştin û birîndar bûn. Pêncê Tebaxê li Rûsya bi Pûtîn re rûnişt. Dixwazin ji bo êrişeke mezin destûrê bigirin. Ji bo Iraqû jixwe ji Amerîka û NATO destûr girtiye. Çawa bixwaze dikeve Iraqê. Qedexe ne qedexe sîha û balafirên xwe bi kar tîne. Li her dere baregehên leşkerî ava dike. Lê li Sûriyê bê destûra Amerîka û Rûsya nikare dagîr bike.

Qada hewayî ya Sûriyê di destê Amerîka û Rûsya de ye. Digel wê dewleta tirkî bênavber bi sîha êriş dike û dikuje. Deng ne ji Amerîka ne ji Rûsya derdikeve. Wisa xuya dike ku destûra kuştinê dane.
Piştî vegera ji Rûsya Erdogan got, me û Rûsya li hev kir. Dibêje li hemberî keriyên kujeran emê têkoşînê bikin. Dema dibêje keriyên kujeran mebesta wî ne rêxistinên weke DAIş û El Nusra ne. Derdê wî YPG û QSD ye. Ango hêzên li hemberî DAIş`ê şer kirîn. QSD`ê li Sûriyê ne xwe û erdê xwe tenê parastin. Dinya tev parastin. DAIş şkand. Erdogan ev hezim nekir. Ji bo wê dixwaze herêmê bêistiqrar bike da zemîn ji DAIş`ê re vebe. Weke din herêmên dagîrkirî ji wan re kirine herêmên ewle.

Ew kesên ku Erdogan ji wan re dibêje keriyên kujer, bi Amerîka û Koalisyona Navneteweyî re li hemberî DAIş`ê şer kirin. Wê deme Amerîka û Koalisyon jî dibin kujer. Rûsya jî bi lihevkirina van hêzan hat bakur û rojhilatê Sûriyê. Leşkerên Sûriyê li ser sînor hatin bicîkirin. Ev jî dibin şirîkên `keriyên kujer`. Erdogan dinyayê ehmeq xwe jî biaqil dibine. Berjewendiyên dewletên mezin wî wisa didin axaftin. Her kes dizane ku destê Erdogan bixwîn e û bi rêxistinên weke DAIş û El Nusra re itîfaq kiriye. Ji her kesî pirtir Amerîka û Rûsya dizanin ka Erdogan ji teba ye. Sûcên kirîn dosyayên wan tev di deste wan de ne. Eger Erdogan evqasî xwînê dirijîne, bi saya berjewendî û politikaya van dewletan e.